~~24~~ 26.27/9/87

NEREDE BİR YOLDAŞ VARSA TKP ORADADIR

Bu programımızda, TKP MK organı Atılım'ın 15 Eyl 1 günlü sayısında yer alan iki yazıyı sunacağız. Bunlardan ilki Aydın Turan imzasını ve "Demokrasi kültürü ve sol" başlığını taşıyor. İkinci yazı ise Mehmet Ergül'ün ve "Lenin'i kavrama yolunda birkaç adım atabilmek" başlığını taşıyor.. Ardından Kürtçe programımız geliyor.

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

TKP'nin Sesi 27.9.1987

Kürtçe: Irak'ın Narlı köyüne yaptığı hava sal. Ahmet

Evren'in Kürt köylülerine göç çağrısı.

Müzik: Dujmın kete Kurdıstan. 4. dk.

Dujmın kete Kurdıstan

Belê Gundarên delal, du balafırên şer yê Iraqê êrişek anin ser gundeki Kurd. Balafırên şer yê Iraqê lı gundê Narlıyê ya gıred ayi qeza Çukurca yê ya Heqqariyê bombebarandın. Dı encama bomberana balafırên şer yê Iraqê dax yek jın, û du mêr, sê gundiyên Kurd jiyana xwe wundakırın. 4 gundiyên Kurd gıran, 20 gundiyên Kurd ji bırindar bûn. Pıştî êrişa bomberanê gelek gom, axo û malên gund ji hırşiyan. Navê gundiyên Kurd yên ku dı êrişa bombebarana Iraqê da jiyana xwe wundakırın wûsa ne. Hamza Duman, Abdullah Özcan û Bahriye Erdal.

Belê guhdaren delal, ew êrişa Iraqê ya yekemin nıne. Weki tê zanin hin berê ji dı meha derbasbûyi da balafıren şer yê Iraqê jı sinor derbasbûbûn û lı dıji hınek gunden Kurd, û lı dıji qeza Uludereyê êrişek pêkanibûn.

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

Dîsa dı 10'ê meha Pûşperê da qasi 20 leşkerê İranê lı Vanê sinor derbaskırıbûn û ketıbûn gundeki Kurd û pıştî kuştına gundiyeki Kurd dest û piyên xwe lıbakırıbûn û ~~dîsa~~ şûnda zıvırıbûn Iranê.

Yekıtiyên leşkeri yên Tırk ji jı Gulana 1983'aya vırda 3 cara êrişen hewa,gelek caran êriş bır ser Kurdên Kurdıstana Iraqê.

Weki ku bıbir were cara ewılin dı Gulana 1983'yan da,cara duwemin ji dı meha Gelarêzana 1984'an da balafıren Tırk êriş bırıbûn ser gele Kurdê Kurdıstana Iraqê tevi zarok û pirekan gelek gundiyên Kurd hatıbûn kuştın.~~Cara dawin~~ Dîsa ji dı roja 15 Tebax 1986'an da 10 balafırên bomberanê yên gıredayi qewetên hewa yê Tırkiyê êrişek har bırıbûn ser Kurdıstana Iraqê û dı encama vê êrişa har da bıpırani jın û zarok 200 gundiyên Kurd hatıbûn kuştın.Pıştî ve êrişa bıxwın yekıtiyên qomandoyan ji lı erdê sinor derbaskırıbûn û lı herêmê lı ser gele Kurd teror

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

Carek din ji di roja 4'ê Adarê 1987'an da ~~diser~~ balafirên şer yê Tirkiyê dîsa êrîşek birbûn ser Kurdistana Iraqê û dîsa gelek zarok, jin û gundiyên Kurd hatibûn kuştin.

lıbakırıbû.

Belê,hemû ew êrişên han çı derdıxın raste guhdaren delal? Armanca hemû van êrişen dervay mırovatiye eşkereye.Bı hemû van êrişen har tê xwastın ku tevgera netewiya Kurd were perçıqandın û Tırkiye tevi agırên şer ye herame bıbe.Bı hemû van êrişen bıxwin hezên zordest dıxwazın ku pırsıyara Kurd,netewaye Kurd jı ortê were rakırın.

Weki tê zanin rejima Evren-Ozal dı mena Tebaxê ya sala derbasbûyi da dı neminentgenê da zagonek ku lı dervayi sinor bırêkırına operasyonên leşkeri dıda hukumatê û qurmaya gıştı derxıstıbû.Nıha tê ditın ku bı eyni şıklı operasyonên leşkeri jı aliyê Iraqê da lı Kurdıstana Tırkıyê pêkten. Hemû ew êrışên dıji gelê Kurd carek dın jı derdıxın rastê ku hemû gotınên rejima Evren Ozal yên ser "Baweriya sinor,yekıtiya erd" û bısuckırınen cudakariye çıqas rureşiyek mezın e.

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

Ka qaşo rejima zordest "sinorên xwe"dıparast?Ka qaşo rejima Evren-Ozal mal û canê gel dıparast?.Nıha bı van êrişan carek dın ji lıpêş çavan tê raxıstın ku hemû gotınên rejima Evren-Ozal derewın.Lewra her kes dıbine ku balafırên şer yê Iraqê sinor derbasdıkın û tên gundên Kurdıstana Tırkiyê bombebaran dıkın.Belê lê rejima Evren-Ozal lı dıji êrişên han çı dıke.Hemû gelê Kurd û Tırk lı pêş çavên xwe dıbine ku rejim lı dıji van êrişên bıxwin bêdeng dımine.

Ew rewşa cadek dın ji dıde xuya kırın ku daxweziya PKT û hêzên demokrasiyê yê dın,daxweziya rakırına fermana operasyona dervayi sinor çıqas lı ci ye û bıheq e.Lewra hemû ew êrişên bıxwin xeteriyên hin ji mezın nişan dıkın.Xuyaye ku dawiya vê rêyê tune ye.Jı vê sedemê ~~şere~~

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

sedemê ji geqe peymana ku fermanâ dıde lı dervayi sinor operasyonên leşkeri pêkwerın gere destra were iptalkırın.

PKT weki hemû êrişên ser gelê Kurd,êrişên balafırên Iraqê ji protesto dıke.PKT bı hemû hêza xwe hemû mafên netewiyê demokratik yên netewayê Kurd dıparêze.

Gundino, xebatkarno,hemû gelê Kurd û Tırk!

Jı bo ku operasyonên qırkırınê yên ser gelê Kurd werın sekınandın, Jı bo ku bombebaranên ser gundiyên Kurd werın sekınandın,jı bo ku hemû yekıtiyên leşekeri yên rejima Evren-Ozayl jı Kurdıstana Tırkiyê şûnda werın kışandın hêzên xwe yekbıkın,dengê xwe bılınd bıkın.

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

Müzik: De lê lê Berivanê, bı hesreta Kurdıstanê
Koma Azadi (6)

Xwişk û bırayên delal,guhdarên hêja,çend roj berê dı gera xweya Diyarbekırê da Kenan Evren dısa rûyê xweyê dıjmıne gelê Kurd eşkere kır. Kenan Evren dı axaftına xweya Diyarbekırê da eşkere eşkere gazı gundıyên Kurd kır got"Jı mezre û gunden xwe derkevın,koçbıkın,lı gundên mezın û bajaran bıcih bıbın." Belê, Evren dı axaftına xwe da dısa gefgaz barandın ser gelê Kurd.Qaşo Evren ~~koçkırına gundiyên Kurd~~ jı bo parastın û hızûra gundiyên Kurd koçkırına van dıxwaze.Lê gelê Kurd rûye reş yê Evren baş nasdıke.Gelê Kurd dızane ku jı roja ku Evren bı darê zorê hat ser hukım vır da lı Kurdıstana Tırkiyê ne baweri,ne ji hızûr heye.Lewra rejima Evren-Ozal bı salane ku eşkere eşkere lı dıji gelê Kurd şereki bıxwin dıdomine. Jı 12 Kewçerinê vır da heta nıha bısedan gundên Kurd hatın valakırın, bıhezaran gundıyên Kurd jı erdên bav û kalên xwe bı darê zorê hatın ajotın.

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

zılm,zordestı,êşkence,kuştın,ajotın û hovıtiya ku gelek salên dırêjın gelek Kurd neditıbû, gelê Kurd jı 12 Kewçerinê şunda dît.Bı salane ku zılm û zordesti tu car jı jiyana gelê Kurd dûrneket.Bı salane ku lı ser gelê Kurd hovitiyek bıxof didome.Jı ve sedemê jı gelê Kurd baş dızane ku armanca Evren parastın û nızura gelê Kurd nıne.Lewra rejıma Evren-Ozal bıxwe nızûr jı ortê hılaniye.Rewş lı pêş çavan e.Gelê Kurd roj bı roj hêsıran dıbarine,xwînê dırıjine.Sedema vıya ji tenê bı tene ew rejima Evren-Ozal bı xwe ye.Lê Evrenê zordest hemû ve zılm û zordes-t iyê hemû van ajotın û valakırana gundan têr nabine.Kenan Evren eşkere eşkere gazi gelê Kurd dıke ku gundiyên Kurd erdên bav û kalan ye bı sed-salan bıterıkinın.Rejima Evren-Ozal geh bı kuştınan,geh bı valakırana gundan,geh ji bı ajotına gundiyên Kurd armanc dıke ku jı gelê Kurd jı pırsiyara Kurd tıştek nemine,gelê Kurd u pırsiyara Kurd jı ortê wedın

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

rakırın.Jı bo viya ji rêbırên rejimê dı paş deriyên gırti da roj bı roj planên reş yên nûh çêdıkın.Lê belê gelê Kurdê hemû van planên reş yê rejima Evren-Ozal vala derxine.Diroka gelê Kurd ve rastiyê han rayê hemû dost û dıjmınan da ye.Tu zılm û zordariyek nıkare gelê Kurd jı ortê rake.Tu zolm û zordariyek nıkare pırsiyara gelê Kurd jı ortê rake.Gelê Kurd baş dızane ku Kenan Evren hızûra gelê Kurd naxwaze,çepê viya dıxwaze ku gelê Kurd jı ortê rake.Jı bo viya dıgıxwıle.Ew dıjmınê gelê Kurd e.Jı vê sedemê ji gelê Kurd bı derewên rejima Evren-Ozal,bı derewên Evren naxape.

Belê guhdarên delal,rejima Evren-Ozal bı salan gelê Kurd dı bınê zılm û zordestiyên gıran da,dı bınê rêbırınaleşkeri da hemû mafên netewiyê gelê Kurd bı hoviti perçıqand.Bı rakırına rêbırına leşkeri ji waliyê hêramiyê halê nehiniti lı Kurdıstana Tırkiyê sazkır.Armanca rejimê zordest disa neguheri.

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI TÜSTAV

Rejim bı sazkırına waliyê hêrami dıxwaze zılm û zordestiyên ser gelê Kurd hin ji zêde bıke.6 Partiyên ku Yekıtiya Çep a Tırkiyê û Kurdıstana Tırkiyê damezırandıne dı belavoka xweya lı ser sazbûna waliyê hêramê yê halê nehiniti da vê rastiyê nişandıkın.Dı belavoka Yekıtiya Çep da nişan dıbe ku 60 sal berê ji lı dıji gelê Kurd mufettişiya ûmûmi( hatıbû sazkırın. Lê nıha jı ya ewılin 60 sal şûnda jı nuh ve lı dıji gelê Kurd mufettişiya ûmûmi tê sazkırın. Rejima diktatoriyê ~~bı viya~~ dıxwaze bı viya pêkaninên xweyê zordariya lı ser gelê Kurd rêsmi û zagoni bıke.Rêbırınaleşkeriya ku bı sıvili dıdome vê jı vır şûnda dı bınê fermana qumandareki sıvil da were ajotın.Ew qumandarê nûh yê ku xênci qolordiyek taybet,hemû hêzên polês û cendırmeyên hêramê dı bınê fermana wi da ne,ger ku dılê wi bıxwaze vê ajotınên komi pêkbine,mezre û gundan valabıke,

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

gundan yekbıke,veşandına organên ku lı hêramê tên veşandın qedexe bıke,veşemên ku lı dervayı hêramê tên veşandın lı hêramê qedexe bıke.Û jı hemû van pêkaninan lı ber dadgeha bılınd û neminentgehê berpırsiyar nıne.

Guhdarên delal,dı belavoka Yekıtiya Çep da paşê evana nişan dıbın.Ya ku tê xuyakırın evaya ye ku bı sazkırına waliyê hêramiyê halê nehiniti terora dewletê ya ku heta iro hatiye dıtın vê qat bı qat zêde bıbe,ajotınên komi,heta qırkırınên bı komi ji pêkwerın merov şaş nabın.Bı gotınek dın,waliyê hêramiyê halê nehiniti bı van fermanen ku hatiye xemılandın ve lı Kurdıstanê bıkeyfitı û zordariya dewletê ~~xx xxx~~ ya jı iroyin ~~p~~ hin ji pır pêşda bıbe.~~Lê belê babet tênê hin ji zêdekırına terora dewletêya ku heye nıne.~~ Bele gude ji vê sedemê gerê em hemû bihevra dengê xwe bilind bikin.

Jı mufettişiyên ûmûmi yên nuh ra na!

Bıra zulm û zordariyên li Kurdistana Tirkiyê werin sekinandin.

Ji koşkirin û ajotinan ra na!

Mûzik: leşkerê Kurdim 2dk.

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI TÜSTAV